Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :823 23-Kanûn- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Siko: Gelê Kurd kiryarên PDK`ê qebûl nake

## Li cîhanê ser 74 milyonî re kes bi koronayê ketine



**Li cîhanê ser 74 milyon kesî re bi koronayê ketine û nêzîkî 2 milyon kesî jî ji ber koronayê mirine.**

Li gorî daneyên cîhanî yên li ser marpela Reutersê hatîn eşkerekirin, li seranserê cîhanê zêdetirî 74 milyon kesî bi koronayê ketine û nêzîkî 2 milyan kesî jî mirine.

Li gorî Reuters, Emerîak welatê herî zêde ye ku korona lê belav bûye, pişt re di rêjeya duduyan de Brazil, Tirkiye, Rûsya û Hindistan tên.

Herwiha ji aliyê hejmara kesên bi koronayê mirine Emerîkayê di rêzê yekê de ye, pişt re Brazil, Îtalya, Meksîka û Almanya tên.



**Ebdukerîm Siko got, “Gelê Kurd kirinên PDK`ê qebûl nake û diyar kir ku dîrok wê binivîse ku hêzên vê partiyê êrişî gerîlayên ku li hemberî dewleta tirkî ya dagîrker li ber xwe didin, kirine. Siko girîngiya yekîtiya kurdî destnîşan kir.**

Sekreterê Partiya Demokrat ya Kurdistanê ya li Sûriyê Ebdulkerîm Siko êrişa hêzên Partiya Demokrat ya Kurdistanê (PDK) ya li dijî du erebeyên Hêzên Parastina Gel (HPG) ku di encamê de 3 şervan birîndar bûn û rewşa 2 ji wan giran e, şermezar kir.

Siko diyar kir ku HPG li hemberî dewleta tirkî ya dagîrker disekine, PDK jî HPG`ê asteng dike û ev yek bi “Şaştiyeke mezin” bi nav kir.

Siko êrişa PDK`ê bi “Sûceke mezin” ku wê di dîrokê de were nivîsandin, wesifand û got, “Gelê Kurd bi gelemperî van kirinên PDK`ê red dike.”

Siko di dewama axaftina xwe de diyar kir ku Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) êrişî hêzekê yan jî partiyekê yan jî tevgerekê nekiriye, berovajî wê ji bo gelê Kurd û doza wî têdikoşe.

Herwiha diyar kir ku mafê vê partiyê ye ku li her herêmeke ji Kurdistanê têbikoşe.

Sekreterê Partiya Demokrat ya Kurdistanê li Sûriyê, bal kişand ser hewldanên yekîtiya kurdî û çareserkirina nakokiyên girêdayî komkirinên PDK`ê hêzên xwe li herêmên Parastina Medyayê û êrişên li dijî hêzên gerîla û got, “Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê niha hewl dide çareseriyekê ji vê nakokiyê re bibîne. Divê hêzên kurdî desteka vê hewldanê bikin. Di vê pêvajoyê de divê ji nakokiyan dûr bikevin û hewl bidin yekitî pêk were.”

## Quncika têgînan

| | |
|---|---|
| **Insiyatîf (Fransî)** | **1. Selahiyeta dayîna biryaran.**<br>**2. Teybetiya kesê dizane biryarên girîng bide:** ***Filankes bi insiyatîf e. Di nava xwe de insiyatîfek ava kirin. Insiyatîf xist destê xwe.*** |
| **Kanalîzasyon (Fransî)** | **Di binê erdê de kanalên ku ava vexwarinê, yan jî ava pîs di wan de derbas dibe. Coya binerdî, Karêz.** |
| **Kongre (Fransî)** | **Civîna herî bilind ya partî, yan saziyekê ku biryar tê de tên dayîn, yan jî serok tên hilbijartin.** |
| **Komplo (Fransî)** | **Plan û projeyên bidizî. Bêbextî, mûamere:** ***Serokên Kurdan tev bi komployan hatin girtin û kuştin.*** |
| **Konsept. (Fransî)** | **Plan û projeyên ku gelek xalan di nava xwe de dihewînin: Êrişa ser Eyn Îsa parçeyek ji konsepta dagîrkeran e.** |
| **Panel (Fransî)** | **Rûniştin û civîna ji her kesî re vekirî. Yên tevlî dibin tev dikarin nêrîna xwe bêjin:** ***Di tv. de li ser mijara jinan panelek hebû.*** |
| **Pêngav** | **Destpêkirina karekî girîng, pêşdeçûyîn, çûna bi ser dijberê xwe de. Hemle:** ***Pêngava 15ê Tebaxê ji bo Kurdan pir girîng bû.*** |
| **Semîner (Fransî)** | **Civîna bi rêveberiya kesekî yan çend kesan, ji bo dayîna zanyariyan derbarê mijarekê de û gotûbêjkirina li serê: Mûhadere.** ***Li ser mijara Neteweya Demokratîk semînerek hat dayîn.*** |
| **Slogan. (Fransî)** | **1. Gotina kurt û balkêş ku nêrînekê diyar dike û bi hêsanî tê dubarekirin. Durişm:** ***Çalakkeran bi “slogana” Bimire dagîrkerî” dewletên dagîrker şermezar kirin.***<br>**2. Gotina ku armanc û amûrên nasnema, civak û rêxistinekê bi awayekî cewher dide nasîn:** ***Slogana filan partiyê ya vê serdemê wiha ye:*** |
| **Statû(Fransî)** | **1. Rewşa kesekî, di nava sazî yan civakê de:** ***A. di şaredariyê de dixebite lê statûya wî (karker e, karmend de, berpirs e) ne diyar e.***<br>**2. Li welatekî rewşa civakekê di destûrnameyê de:** ***Di destûra Tirkiyê de statûya Kurdan nehatiye diyarkirin.*** |

## Ji nava zor û zehmetiyan bajarekî nûjen

**Jiyan BOZO/Ronahî-Amûdê**



Her bajar taybetmendiyeke wî heye. Bajarê Amûdê jî bi avayiyên xwe yên kevin tê nasîn. Lê di salên dawiyê de avayiyên nûjen tên avakirin. Gelo cudayiya di navbera avayiyên kevin û yên nû de çi ye?

**“AVAYIYÊN KEVIN DÎROKA BAPÎR Û DAPÎRÊN ME TÎNIN BÎRA MIN”**

Li ser vê mijarê welatiyê ji bajarê Amûdê Nûrî Şêxmûs Esad yê 58 salî wiha axivî: “Ez ji avayiyên kevin pir hes dikim. Avayiyên kevin dîroka bapîr û dapîrên me tînin bîra min. Demsala zivistanê pir germ in û havînê jî pir honik in. Şevbêrkên avayiyên kevin pir xweş bûn. Mirov ji bêhna axê têr nedibû. Lê avayiyên nû zivistanê pir sar in û havînê jî pir germ in. Lê ji bo paqijî û pêşxistina şaristaniya bajêr baş in. Welatê me pir dewlemend e û yek ji bingehên şarastaniyan e. Ji ber wê divê em baş lê xwedî derkevin û biparêzin.”

**“RENG Û DENGÊ AMÛDA BAVÊ MIHEMED LI HER DERÊ BELAV DIBE”**

Îbraîm Misko jî wiha diyar kir: “Ez ji bajarê Kobanê me. Ev çend sal in li bajarê Amûdê dijîm. Dema mirov bixwaze li ser avayiyên kevin biaxive gotin têrê nakin. Çimkî dîrok û bîranînên xweş tînin bîra mirovan. Şevbêrk, germayiya civatan û girêdana bi malbatê ve tên bîra min. Dema cara destpêkê hatim Amûdê avayiyên kevin pir bala min kişandin. Min pir ji wan hes kir û pir xwest di wan de bijîm. Rêjima Sûrî bi welatiyên bajêr pir êş dane kişandin. Nehiştiye gel vî bajarî pêş bixe û di hêla aborî de pir xizan kirine. Ji bo wê, berê dema em dihatin bajarê Amûdê, her kesî ji me re wiha digot; hay ji xwe hebn rêjim û sîxurên wê we negirin. Lê piştî şoraşa Rojava bajar pir pêş dikeve. Êdî avayiyên nû çêdibin û aboriya bajêr baş dibe. Reng û dengê Amûda bavê Mihemed li her derê belav dibe. Banga min ji Rêveberiya Xweser re ew e ku li vî bajarî xwedî derkeve û aboriya wî pêş bixe.

# Cemal Şêx Baqî: Li dijî Kurdan komplo hene û PDK bi komplogeran re ye



***Cemal Şêx Baqî*** da zanîn ku planeke mezin li dijî destkeftiyên Kurdan heye, bi taybetî li dijî rojavayê Kurdistanê û herwiha sekna PDK’ê li gel komplogeran çewtiyeke dîrokî ye. *R-4*

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 823 23-Kanûn- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Rêveberiya Xweser qedexeya qismî 15 rojên din dirêj kir



Rêveberiya Xweser ji ber vîrûsa Korona, bi biryara jimara 229’an ya qedexeya qismî 15 rojên din li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê dirêj kir.*R-2*

# Rûsya bi kopalê Tirkan êriş dike

Artêşa tirkî ya dagîrker û çeteyên wê bi awayekî hovane êrişî navçeya Eyn Îsa dikin. Dewleta tirkî balafirên şer û yên bêmirov di van êrişan de bi kar tîne. Hevseroka MSD`ê Emîne Umer diyar kir ku Rûsya berpirsa êrişan e û got, ji bo ku navçeyê radestî hêzên hikumeta Şamê bike, Rûsya zorê dide QSD`ê. *R-4*




## YJA Starê nasnameya Fermandar Aryana Baran eşkere kir



Fermandariya Biryargeha Navendî ya YJA Starê nasnameya fermandar Aryana Baran ku di Mijdara 2020’an de li Herêmên Parastinê yên Medyayê ji ber nexweşiya pençeşêrê şehîd bûbû eşkere kir. *R-3*

## Hêzên Hewayî ya Şehîd Delal Amed li Heftenînê li dijî dagîrkeran du çalakî kirin



HPG’ê ragihand ku li Heftanînê hêzên Hewayî yên Şehîd Delal Amed 17’ê Kanûnê li dijî hêzên dagîrker du çalakî kirine. *R-5*

## ‘Dixwazim çanda dayîka xwe zindî bihêlim’



Fikret Mistefa ev 30 sal in bi benikê rîs cilan çêdike. Fikretê derbarê çêkirina cilan ya bi benikê rîs de wiha got: “Armanca min ji vî karî ew e ku çanda dayîka xwe zindî bihêlim û tiştên baş bidim civakê.” *R-7*

# Rêveberiya Xweser qedexeya qismî 15 rojên din dirêj kir

Rêveberiya Xweser ji ber vîrûsa Korona, bi biryara jimara 229’an ya qedexeya qismî 15 rojên din li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê dirêj kir.

Di biryara Rêveberiya Xweser de wiha hat gotin: “Li gorî civîna Şaneya Aloziyê ya Meclisa Rêveber ya bakur û rojhilatê Sûriyê û li gorî berjewendiyên giştî, hevserokatiya Meclisa Rêveberiyê ya bakur û rojhilatê Sûriyê ev biryar dan;
Qedexeya qismî li seranserê herêmên Rêveberiya Xweser yên bakur û rojhilatê Sûriyê ji bo dema 15 rojan dirêj dibe.
Qedexe ji sibeha Duşemê, 21’ê Kanûnê heta 4 Çilya 2021’ê ye.
Bendên dirêjkirina dema qedexeya qismî ya pêşîgirtina li vîrûsa Korona wiha ne;
-Ji bilî sûkên mezin, tevayiya dikanên bazirganiyê, dikanên xwerek û sebzeyan tên vekirin, lê divê saet 5’ê êvarê werin girtin,.
-Dibistan, zanîngeh û navendên perwerdeyê tevî tedbîrên parastin û xweparastina ji vîrûsa Korona vekirî dimînin.
-Bas û erebeyên ku derdikevin û dikevin herêmên Rêveberiya Xweser dikarin tev bigerin.
-Ji bilî nimêja înê û pîrozayiya Yekşemê bi girtina tedbîrên xweparastinê, cihên îbadetê tên girtin.
-Kombûnên mezin, mîna holên şahiyan, konên sersaxiyê, civîn û kongre qedexe ne.
-Divê welatî û xebatkdarên saziyên Rêveberiyên Xweser maskan bi kar bînin, parastina şexsî bikin û li her cihî ji hev dûr bikevin.

## Şehîdê berxwedana Eyn Îsa Demhat Til Koçer spartin axê

Bi sedan şêniyên herêmê û şervanên QSD`ê beşdarî merasima cenazeyê şervanê Hêzên Sûriya Demokatîk Mûrad Elî (Dehmat Til Koçer) bûn ku 18`ê mehê di bersiva êrişên dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê yên li ser navçeya Eyn Îsa de şehîd bûbû.
Di merasima li goristanê de ji fermandarên QSD`ê Mihyedîn Xêrikî wiha axivî: “Her kes dizane ku ji destpêka şoreşê ve, komên bi navên cuda yên weke çeteyên DAIŞ`ê, Cebhet Nusra, Artêşa Azad êrişî herêmê dikin û komkujiyan dikin. Navçeya Til Koçer jî para xwe ji êrişan girt. Em fedakariya gelê Til Koçer ji bîr nakin ku ji bo parastina xak û gelê xwe bi dehan ciwanên xwe dan.”



Endamê Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Sirûr Şetî jî wiha got: “Şehîd Demhat Til Koçer li Eyn Îsa destaneke dîrokî nivîsî û hevalên wî hê li hemberî dijmin li ber xwe didin.”
Piştî axaftinan wesîqeya şehîd Demhat Til Koçer hat xwendin û radestî malbata wî hat kirin.
Pişt re cenazeyê şehîd Demhat li goristana şehîdan ya Til Koçer di nava tilîliyên dayîkan û durişman de hat veşartin.

## Hêzên Ewlekariya Hundir 46 kesên gumanbar girtin

Hêzên Ewlekariya Hundir li gundewarê bajarê Qamişlo û navçeya Tirbespiyê di operasyonekê de 46 kes ku ji aliyê dadgeriyê ve dihatin xwestin, girtin.
Hêzên Ewlekariya Hundir li ser mijarê daxuyaniyeke nivîskî weşand.
Di daxuyaniyê de ev agahî hatin parvekirin: “Hêzên me sibeha roja Înê 18’ê Kanûnê, di operasyoneke berfireh ya paqijkirinê de kesên ku ji ber sûcên cuda ji aliyê dadweriyê ve dihatin xwestin, girtin.
Hêzên me yên ewlekariyê; Hêzên Asayişa Jinê, Hêzên Operasyonê û Hêzên Taybet (HAT) beşdarî operasyona li herêmên gundewarê rojhilatê bajarê Qamişlo û gundên navçeya Tirbespiyê bûn, da ku kesên ku sûc kirine û ji aliyê dadweriyê ve têne xwestin bigirin.
Bi koorîndeyeke rasterast bi Dadgeha Giştî û meclisên Edaleta Civakî re, operasyona paqijkirinê saet 04:00’ê sibê dest pê kir. Di encamê de hêzên me 46 kesên ku dihatin xwestin girtin.”

## Tevgera artêşa tirkî ya dagîrker û çeteyên wê li Til Temir û Zirganê zêde bûye



Artêşa tirkî ya dagîrker û çeteyên wê komkirina hêzên xwe tevî çekên giran, li ser dirêjayiya eniyên nêzî riya di navbera navçeya Til Temirê û Zirganê de yên Kantona Hesekê didomînin.
Tevgera artêşa tirkî û çeteyên wê metirsiyên êrişeke nû li dijî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê çêdike. Nexasim tevgerên wê yên dawî yên hemwextî êrişên wê yên dijwar li dijî Eyn Îsa. Ev tevger û êriş li gel bêdengiya garantorên lihevkirina agirbestê Rûsya û Emerîka pêk tên.
Li gorî dîmenên ku hatine kişandin, tevgerên çeteyan herî zêde li gundê Til Minax û Um El-Işbe li gundewarê Zirganê ne yên ku dewleta tirkî ya dagîrker dagîr kirine. Ji dîmenan tevgerên çeteyan, tevgera erebeyên leşkerî û xurtkirina baregehan li gundê Rîhaniyê li gundewarê Til Temir diyar dibin.
Li gorî agahiyên ku hatine bidestxistin, bi tevgerên çeteyan re û piştî hedefgirtina erebeyên sivîlan û sahrîcên avê yên ku şaredariya Til Temir ji gundên ku av nagihêjiyê re şandine, tevgera sîvîlan li ser riya di navbera navçeya Til Temir û Zirganê de kêm bûye.

## Fermandarekî QSDê: Li Eyn Îsa 12 çete hatin kuştin û alaveke wan hat roxandin

Ji fermandarên QSD’ê Ziyad Heleb diyar kir ku êrişên dagîrkeran yên li ser gundewarê Eyn Îsa şkandine û got, “Berxwedanan şervanan bi ruhê serkeftinê dewam dike”.

Artêşa tirkî ya dagîrker û çeteyên wê 18’ê Kanûnê êrişî gundê Cehbel û Mişêrfe yên navçeya Eyn Îsa ya Herêma Firatê kirin. Di heman demê de riya M4 û derdora navenda navçeyê topbaran kirin.
Şervanên QSD’ê nehiştin dagîrker li herêmê pêş bikevin. Di encama şerê derketî de 12 çete hatin kuştin û alaveke wan ya leşkeri hat roxandin.
Derbarê êrişê û berxwedana li hemberî wê de, ji fermandarên Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) Ziyad Heleb ji ANHA axivî.
Ziyad Heleb li ser mijarê wiha axivî: “Artêşa tirkî û çeteyên wê êrişî gundê Cehbet û Mişêrfe kirin û hêzên me bersiva wan dan.”



Girêdayî idîayên çapemeniya girêdayî dewleta tirî ku du gund dagîr kirine, Ziyad Heleb got, ev tev derew in. Ew gund hê jî di binê serweriya me de ne, lê carna şer derdikeve.”
Ziyad Heleb herwiha got, “Şer du rojan dom kir. Li gorî me bi çavan dîtî, 12 çete hatin kuştin û alaveke leşkerî hat roxandin.”
Ziyad Heleb wiha bi dawî kir: “Berxwedana şervanên me bi ruhê serkeftinê dewam dike û nahêlin çete derbasî van gundan bibin.”

## Çalakvanên greva birçîbûnê: Berî her kesî mafê Rêbertiya me heye ku di nava gelê xwe de be

Greva birçîbûnê ya ji bo şkandina tecrîda li ser rêber Abdullah Ocalan û têkbirina zordariya li zindanan hatî destpêkirin, di roja 27`an de didome.

Çalakiya greva birçîbûnê ya ji bo şkandina tecrîda li ser rêber Abdullah Ocalan û bidawîkirina zordariya li girtîgehan, ji aliyê gitiyên PKK û PJAK’ê ve 27`ê Mijdarê hatî destpêkirin, di roja 27an de bi koma 5. didome.

**‘HETA BIGIHIN ARMANCA XWE…’**

Li Girtîgeha Jinan ya Sîncanê Dîlber Tanrikulu li ser çalakiyê ev peyam da:
“Armanca çalakiya me rakirina tecrîda li ser Rêbertiya me û azadiya wî ya fîzîkî ye. Berî her kesî mafê Rêbertiya me heye ku di nava gelê xwe de be. Ji bo vê jî tişta ji destê me bê emê bikin. Çalakiya me heta bigihe armanca xwe wê dom bike. Em bawer dikin ku wê çalakiya me encameke mezin ya serketî bi xwe re bîne. Divê her kes destê xwe bixe bin kevir. Em bi hev re vî barî rakin û bigihînin serketinê.”



# ‘Dixwazim çanda dayîka xwe zindî bihêlim’

Fikret Mistefa ev 30 sal in bi benikê rîs cilan çêdike. Fikretê derbarê çêkirina cilan ya bi benikê rîs de wiha got: “Armanca min ji vî karî ew e ku çanda dayîka xwe zindî bihêlim û tiştên baş bidim civakê.”



*Sara Şêx Hesen/JINNEWS*

Jin bi keda xwe ya destan her dem çanda xwe diparêze û di her aliyê jiyanê de dide jiyandin. Çiqas teknolojî pêş bikeve jî ti tişt nagihe wateya keda destan. Çêkirina cilên bi rîs çandeke dayîkan e. Jina bi navê Fikret Mistefa ya 54 salî û dayîka 4 zaroka, li taxa Şêx Meqsûd ya bajarê Helebê dijî. Fikret ev nêzî 30 salan e bi benikê rîs cilan çêdike, herwiha li taxa Şêx Meqsûd dikaneke wê heye û cilên ku bi destên xwe çêdike difiroşe. Di şerê giran yê Taxa Şêx Meqsûd de Fikret dev ji karê xwe berneda û di nava şer de careke din karê xwe domand. Dikana Fikret di nava taxê de binavûdeng e, dema mirov dikeve dikanê bêhna kedê tê. Fikret têkildarî çêkirina cilan bi benikên rîs nêrîna xwe bi me re par ve kir.

**‘Ev 30 sal in ez bi benikê rîs cilan çêdikim’**

Fikretê di destpêka gotina xwe de bal kişand ser karê xwe û wiha domand: “Ev 30 sal in ez bi benikên rîs cilan çêdikim. Me ev kar ji dayîk û dapîrên xwe girt. Îro em wê çandê zindî dikin û hînî zarokên xwe dikin. Herwiha li Taxa Şêx Meqsûd ev nêzî 20 salî ye min dikaneke benikên rîs vekiriye û bê navber di wê dikanê de di her şert û mercî de xebitîm. Di nava şerê giran yê li Taxa Şêx Meqsûdê jî min dev ji dikana xwe berneda û ez her li ser bûm. Pirî caran em di nava dorpeçê de bûn û benikên rîs bi destê min nediketin. Lê min ji Efrînê dixwestin û wisa min karê xwe didomand. Bi Qanûna Qeyser re her tişt pir biha bû, vê bandor li benikên rîs jî kir. Ji bo wê em bi bihayekî giran dikirin. Derfetên pir kesan nînin ku bikirin, lê ez alikariya wan dikim û li gorî derfetên wan didim wan. Dem ew dem e ku her kes alîkariya hev bike. Armanca min ji vî karî ew e ku çanda dayîka xwe zindî bihêlim û tiştên baş bidim civaka xwe. Ez gelek ji çêkirina cilên bi rîs hes dikim. Heta ez li ser piyan bim ez dev ji karê xwe bernadim.”

**‘Keda bi destdan biqîmet e’**

Fikretê di dewama gotina xwe de diyar kir ku tiştên bi destan çêdibin biqîmet in û wiha domand: “Mirov bi keda xwe heye û wisa jî tê nasîn. Tişta bi destê mirovan bê çêkirin, hestekî cuda dide mirovan. Niha cîhan pir guheriye, her tişt amade tê kirîn û ti qîmeta wan tiştên amade nîne. Lê dema mirov cilan bi destê xwe çêdike mirovan germ dihêle û bi salan tu dikarî bi kar bînî. Ji bo wê cilên rîs mirovan ji serma û seqemê diparêzin. Ji taxên Helebê tevan yên mîna Hemdaniyê, Eşrefiyê, Ezîziyê, Silêmaniyê, Siryan û heta ji herêma Şehba jî mirov tên li gel min û ez ji wan re bi benikên rîs cilan çêdikim. Dema ez cilan bi destê xwe çêdikim li gorî daxwaziya kesan neqiş dikim û wisa difiroşim.”

**‘Armanca min parastina çanda dayîkê ye’**

Fikretê herî dawî wiha got: “Divê çanda dayîkê ya kevnar were parastin. Cilên bi benikên rîs çanda kevnar e û divê her tim bê parastin û jiyandin. Herwiha divê em çanda xwe ya dayîkê hînî zarokên xwe jî bikin da çanda me neyê jibîrkirin. Niha min zarokên xwe hemû hînî çêkirina cilên rîs kirine. Lewre armanca min parastina çanda dayîkê ye. Di demsala zivistanê de çêkirina cilên rîs pir xweş e. Mirov li ber sobeya xwe rûdine û bi suhbetên germ cilên xwe çêdike. Eger mirov hînî tiştekî bibe û pê xweş be nikare dev jê berde. Lewre di encamê de keda destan heye.”

## Heskirin û xwestek pencereya geşkirina afrîneriyê ne

Her çiqas bi temenê xwe piçûk e û ji ber aloziya Sûriyê zor û zehmetî dîtine, lê heskirina wê ya nivîsandina roman, kurteçîrok û helbestan sînor nas nekirin, malbatê destek da behreya wê û xewna xwe bi cih anî.

Berî deh salan li Sûriyê şer û aloziyê dest pê kir. Di encamê de bi hezaran sûrî koçber bûn, mal û milkên wan wêran bûn
Tevî şerê li Sûriyê gelek behre derketin holê, ji van behreyan; behreya ciwana bi navê Semaa Îsa ku berî 4 salan li bajarê Minbicê yê Sûriyê bi cih bûye. Ji ber ku li wir aramî û ewlehî peyda dibûn, gelê Sûriyê berê xwe da wir.
Semaa Îsa ya ji bajarê Helebê (17) û ji malbateke xwedî 9 kesan, ji zaroktiya xwe ve dest bi nivîsandina roman, helbest, wênexêzî û kurteçîrokan kiriye.

**DI QADA NIVÎSANDINÊ DE SERKEFTÎ YE**

Semaa Îsa diyar kir ku di 8 saliya xwe de dest bi nivîsandina kurteçîrokên zarokan kiriye. Cara yekê nîşanî malbata xwe dike û malbatê destekê didiyê. Ev wisa dike ku xewna xwe bi cih bîne.
Têkildarî nivîsandina romanan Semaa Îsa ev yek anî ziman: “Min dest bi nivîsandina romanan kir. Min romanek li ser parçebûna malbatê, berdan û bandora wê li zarokan nivîsand, lê ji ber pirsgirêkeke di laptopê de, nivîsa min çû. Ji ber vê min demeke dirêj nenivîsand, lê pişt re li nivîsandinê vegeriyam. Min romanek bi navê Îma nivîsand û wê di demeke nêz de were çapkirin.”
Semaa Îsa da zanîn ku qet nedixwest romana Îma çap bike, heta hêviyên wê tinebûn ku derveyî malbatê ti kes bixwîne, lê malbatê ew teşwîq kir û pêşniyar kir ku biçe Yekîtiya Rewşenbîrên Minbicê, da ku li romana wê vegerin. Bi vî awayî yekîtiyê roman sererast kir û şandin çapxaneyeke li bajarê Qamişlo.
Îma lehenga romanê ye, roman jî behsa heskirina jineke gundan dike ku çûye bajêr û dem jê re divê ku hogirî jiyana civaka bajaran bibe. Paşê bi wan re dibe yek, ji yekî li bajêr hez dike û pê re dizewice.
Semaa di romanê de aliyên hestiyariyê, aliyên bedbîniyê bi şêweyekî wêjeyî dihone.
Niha jî hewldana nivîsandina romaneke din dike, ew jî vegera romana xerab bûyî ye. Romana ku xerab bûbû; behsa doza berdanê û dîroka Helebê dike.

**HESKIRINA WÊ YA HELBESTÊ**

Semaa li kêleka xwendinê, nivîsandina romanan ji nivîsandina helbestan jî hes dike. Beriya niha beşdarî şevbuhêrkeke helbestî ya li Navenda Yekîtiya Rewşenbîran bû, li wir helbestek bi navê “Min temen li ser refikeke kevnare hişt” xwend.
Niha jî Semaa helbestekê li ser welat û jiyana gelê Sûriyê dinivîsa. Semaa da zanîn ku ji ber ew gelek helbest û romanan dixwîne behrehaya wê geştir bûye.
Herwiha helbesta bi navê “Bi min re biaxive ey welatê min” nivîsand. Semaa bîr xist ku diya wê çûye mala wan ya li Helebê, dît ku ji ber topbarana beriya 4 salan mala wan hatiye wêrankirin. Ji ber wê vegeriyaye mala xwe ya li Minbicê û ji Semaayê re behsa xerabkirina malê kiriye û ev di hiş û ramê wê Semaayê de ma. Ji ber wê helbest derbarê wêraniya bi mala wan de hatiye nivîsand.



**NE HELBEST TENÊ, ROMAN Û WÊNEXÊZÎ JÎ**

Semaayê di qada wênexêziyê de jî afrînerî çêkir û wiha dibêje: “Ji zaroktiya xwe ve min ji wênexêziyê hes dikir. Çimkî mirov tişta ku nikaribe binivîse dikare bi wênexêziyê derîne. Ji ber vê wênexêzî pencereya ruh e.”
Semaa bi lêv kir ku gelek tabloyên wê yên sade hene û bi hêvî ye ku behreya xwe geştir bike. Lewre roman, kurteçîrok û xwendina li dibistanê gelek wextê wê dixwin.
Semaa Îsa di dawiya gotina xwe de eşkere kir ku hewl dide hevsengiyê di nava behre û xwendina xwe de çeke. Lewre ji xwendinê hes dike û paşroja wê ye.



## Kewê Ribat Miradê Kinê (1942-1984)

Sîpan Şînda

Kewê ribat dixure, dixure, dixure... Lê naweste, naqerime, ew bê navber dixure. Û hingî ew dixure dengê wî pitir vedibe, azdtir dibe, dengê kemaça wî melûltir dibe. Dema ew şivika kemaça xwe bi têlên wê ve tîne, pêlên dengê kemaça wî ji yên çemê Dîcle bi hêztir, sîqîna têlên kemaça wî ji xumxum û gumguma ava Zê bi heybettir derdikeve. Dengê kemaça wî ji nîva dilê wî tê. Dema ew têlên şivika kemaçê bi têlên wê ve tîne, mirov dibêje qey ew têl bi nîva dilê mirovî ve tên. Dengekî ewqasî bi bandor, nazik, nerm û dilşewat; dengbêjekî bêwestan û nefes neçik. Dengê wî çiqas bi bandor e, dengê kemaça wî ji ewqasî dilşewat û melûl e. Dengê wî û yê kemaça wî xwe berdide nîva dilê mirovî.

Ew mîrê kemaçê ye, hostayê stranên şera ya. Ew hozanê dilê evîndara ye. Evîn bi deng û awazê wî ji nûve jîn dibe, zindî dibe. Ew bi wî dengê xwe yê nerm û az ji nû ve giyanê dide evînê, bi dengê têlên wê kemaça xwe ya melûl evîndaran mest û bê hiş dike. Evîn bi saya deng û stranên wî digihêje kemalê; evîndar bi pêlên kemaça wî aşiq dibe, dîn dibe, har dibe. Ew hozanê evînê ye. Lê ne tenê hozanê evînê ye, ew di heman demê de hozanê şer û mêrxwaziyê ye ji. Ewî bi sedan stranên şeran ji gotine. Dema ew stranên şeran dibêje, mirov xwe di nava şerî de dibîne û ciyê xwe di kozik û çeperan de xweş dike. Ewî stranên weke Emê Gozê, Elîkê Betê, Fermane (Mala Eliyê Ûnis) û gelek din stranên şeran gotine. Min ev stran ji gelek dengbêjan guhdarî kirine lê belê strîna Miradê Kinê serdarê hemûyan e. Ew mirovî dibe di nava şeran de, armancê datîne, kozik û çeperan li mirovî dide rakirin. Ew bi pêlên dengê xwe armancê diyar dike û bi pêlên têlên kemaça xwe ji êrîş dike û xayin neyaran bi yek derbê li erdê dide.

Belê Miradê Kinê, di sala 1941 ê li gundê Gira Cehfer ê girêdayî Qoserê tê dinê. Jiber ku malbata wî bi navê Mala Kinê tête naskirin, ew ji bi navê pîrika babê xwe Kinê tê naskirin. Piştî 23 saliya xwe ew bar dike û diçe Kerboranê. Çûna wî ya li Kerboranê riya hunera wî ji vedike û ew di demeke kurt de di nava gel de tête naskirin û nav û dengê wî li welêt belav dibe. Ew êdî dibe kewê ribat û li her derê bakûrê Kurdistanê dengê wî belav dibe. Ji botanê bigire hetanî serhedê êdî ew bi kemaça xwe ve li nava hemû keyf û şahiyan e. Ew êdî di nava gel de weke mîr û milûkan bi qedr û qîmet e. Çend dengbêjên wekî Miradê Kinê derketine û karîne kaba xwe li ya wî bidin ez nizanim. Lê belê keda ewî ji bû çanda Kurdî û dengbêjiyê dayî nayê gotin. Ew dengbêjekî bi seetan ji li ser hev stran gotine lê belê dîsa ji ne westiya ye. Ewî gelek destanên Kurdî yên weke Seyrê û Eliyê Memed, Tevar û Xezalê, Sêva Haciya ji tomar kirine û gihandîne roja me. Bi sedan stranên Kurdî em îro ji dengê wî guhdarî dikin. Lê mixabin siûda wî û ya strana Kurdî zû şkestiye û jî yê wî kurt bûye û ew hêj 42 salî, di temenekî gelekî ciwan de ji nava strana Kurdî bar dike. Belê ew di 17.12.1984 ê li Sêrtê diçe li ser dilovaniya xwe. Ewî xizmeteke pirr mezin ji Kurd û Kurdî re kiriye, lê mixabin hetanî îro ji me nekariye em ji bo Miradê Kinê û gelek kesên din çi tiştî bikin. Jixwe heçî em Kurdin, em mirî hezên zindî kujin. Di 36 saliya koça te de ez te bi hurmet bîr tînim Kewê Ribat.

# Civaka Êzîdî wê xaka xwe biparêze

Hediya HISÊN/Ronahî-Qamişlo

***9ê Cotmehê li dijî vîna Êzîdiyên Şingalê di navbera PDK û hikumeta Iraqê de peymanak hat imzekirin. Êzîdiyên Şingalê diyar kirin ku peyman ji bo wan fermaneke nû ye. Êzîdiyên bakur û rojhilatê Sûriyê jî piştgiriya xweseriya Şingalê dikin û dibêjin, divê ev plana li hemberî Şingalê pêk neyê.***

Çawa ku tê zanîn Tebaxa 2014an çekdarên PDKê Şingal radestî çeteyên DAIŞê yên di cîhanê de herî bixeter kirin. Bi hezaran Êzîdî hatin kuştin û bi hezaran jinên wan hatin revanidin. Piştî hingê hêzên gerîla, YPG û YBŞ Şingal rizgar kirin.

**BINGEHÊ AVAKIRINA CIVAKEKE BIHÊZ VÎNA GEL E**

Derbarê mijarê de Hevseroka Mala Êzîdiyan ya li Qamişlo Leyla Îbrahîm wiha axivî: “Dema em dibêjin Şingal ji ferman û kuştinê pêve tiştek nayê bîra mirov. Parastina Şingalê erkê pêşmergeyan bû lê reviyan û Şingal radestî dijmin kirin. Êdî baweriya me bi vê hêzê nayê.”



Leyla Îbrahîm axaftina xwe wiha domand: “Armanca PDKê û hikûmeta Iraqê ji vê peymanê şkandina vîna gelê Şingalê ye. Li hemberî xetera van planan divê em şiyar bin û neyên lîstikên li dijî doza Kurdî. Civaka Êzîdî nahêle ti hêz derbasî xaka wan bibin, yên derbas bibin dagîrker in. Dibêjin parastina Şingalê erkê me ye, emê xaka xwe biparêzin. Bi dehên caran komkujî hatin serê gelê Şingalê. 74 fermanan têra Kurdên xwefiroş û hêzên dagîrker nekir. Lê Şingala ku bi salan bêxwedî bû, îro xwediya artêşekê ye. Ev plana dewleta tirkî ya dagîrker e û dixwaze vîna gelê bişkîne.”

Leyla Îbrahîm axaftina xwe wiha qedand: “Em civaka Êzîdî van planan bi dijwarî red dikin. Mixabin Şingalê weke pariyek nan li hev par ve dikin. Lê em qebûl nakin, çimkî ev xak xaka me ye û heta dawiyê emê biparêzin.”

# Ji ber nebûna ciyê jeneratorê taxa Kornîş bê kehrebe ye

Darîn SILÊ/Ronahî-Qamişlo



Di roja me ya îro de êdî bê kehrebe jiyan pir zehmet dibe. Çimkî bûye bingehê çavkaniya jiyanê. Li taxa Kornîş ya bajarê Qamişlo nêzî salekê ye welatî di reşê de ne û heta niha jî pirsgirêga wan nehatiye çareserkirin.

Hevserokê komîna Ş. Rûken Ebdulîlah Silêman Xelef li ser mijarê wiha axivî: “Heşt meh in nîvê taxa Kornîş bê kehrebe ye. Destpêkê du jenerator hebûn. Piştî wê jeneratorek xerab bû û ji hingê ve nîvê taxê di reşê de ye. Me jeneratoreke nû anî, lê heta niha cih jê re nehatiye dîtin. Me xwest li nava taxê daynin lê ji ber dengê wê malbatan qebûl nekir. Piştî wê me xwest li dibistana Hisên Ebdulah daynin lê wezaretê qebûl nekir. Hin malbatan xwest em li Baxçeyê zarokan daynin lê me qebûl nekir. Ji ber wê heta niha çareserî nehatiye dîtin.

**“EM KEHREBEYÊ DIXWAZIN”**

Li ser heman mjarê welatiyê bi navê Mihemed El Milî wiha got: “Ez ji bajarê Sere Kaniyê me. Şeş meh in hatime taxa Kornîş. Ji gava em hatîn ve em bê kehrebe ne. Bê kehrebe jiyan zehmet e. Çimkî dema kehrebe tinebe av jî nîne. Em bi findan malê ronî dikin. Havînê em ji germa dişewitîn, niha jî di reşê de ne. Em çûn komîn û şaredariyê jî, lê ti çare nehatin dîtin. Em bi hêvî ne ku çareyek bê dîtin.

**“DIVÊ MALBATÊN TAXÊ PIRSGIRÊKÊ ÇARESER BIKIN”**

Têkîldarî mijarê ji rêveberiya beşa jeneratoran ya Şaredariyê Hemrîn Mihemed Şerîf wiha got: “Despêkê jenerator hebûn û welatî di rehetiyê de bûn. Piştî ku jeneratorek xerab bû welatiyan daxwaziya jeneratorkê kir. Me yek ji wan re peyda kir, lê hê tax bê kehrebe ye. Çimkî ti kes qebûl nake ku li nêzî mala wan bê danîn. Ji ber wê pirskirêk çareser nabe. Em jî dibêjin çareserî di destê welatiyan de ye. Heta ku cî jê re peyda nebe wê pirsgirêk bidome.”

# Astengdarên bedenê ne astengdarên jiyanê ne

Lêzan EBDIKÊ/Ronahî-Qamişlo



Li dinyayê ji sedî 15ê mirovan bi awayekî astengdar in û pêwîstiya wan bi alîkariyê heye. Li her welatî rêjeya astengdaran cuda ye. Lê pirsgirêk ne di rêjeyê de ye, pirsgirêk ew e ku nikaribe xwe xwedî bike, derveyî civakê be û ji astengdariya xwe şerm bike.

**“MIN XWE JI REWŞA ASTENGDARIYÊ DERXIST Û DEST BI KAR KIR”**

Têkildarî mijarê welatiyê astengdar yê bi navê Fayiq Hesen wiha got: “Temenê min 67e. Ez ji bajarê Dêrezorê koçber bûm û hatim bajarê Qamişlo. Ez bavê sê keçan im û her sê jî dixwînin. Tevî ku ji her du lingên xwe astengdar im, ji bo ku zarokên min bêxwendin nemînin min xwe ji rewşa astengdariyê derxist û dest bi kar kir. Karê min jî firotina mendîl û goreyan e. Lê têrî pêdiviyên jiyanê nake, pêwîstiya min bi alîkariyê heye.”

**“BIHABÛNÊ BANDOREKE MEZIN LI MIN KIRIYE”**

Fayiq Hesen axaftina xwe wiha domand: “Lê piştî bilindbûna dolar, dermanên min pir biha bûn, êdî nikarim bikirim. Hem pêdiviyên din jî biha bûne, ji ber wê demek e nikarim ji zarokên xwe re goşt bistînim. Em bi tiştên sivik roja xwe diqedînin. Çavê malbatê li destê min e, lê gelek caran destvala vedgerim malê. Weke din ji ber ku nikarim kiriyê bidim, xwediyê xanî dixwaze min derxe.”

Fayiq axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Ez dîsa kêfxweş im ku hê dikarim kar bikim. Hêvî dikim ku desteya tenduristiyê li rewşa min binêre û bi min re alîkar be.”

# ‘Metirsî li ser bendavên Qamişlo nîne’

Rêveberên Parastina Çavkaniyên Avê diyar kirin ku rewşa bendavên Kantona Qamişlo tevan jî baş e û ti metirsiya hilweşîna wan nîne.

Par ji ber barana zêde li gundên li kêleka bendava Meşûq û Mizgeftê yên navçeya Tirbespiyê şape rabû. Ji bo tedbîrê Rêveberiya Parastina Çavkaniyên Avê bendav restore kir, riyên avê yên nû vekirin û paqij kirin.

Li Kantona Qamişlo 7 bendav hene, bendava Meşûq û Mizgeft li navçeya Tirbespiyê, bendava Çilaxa û Zexîre li navçeya Çilaxa û bendava Seqan, Hakimiyê û Borzî li navçeya Dêrikê ne.

Piştî baran û şapeya sala borî tirsa gel ya hilweşîna bendavan hebû, bi taybetî ji ber ku hin bendav derizîne. Ji rêveberiya Parastina Çavkaniyên Avê Mûsa Xelef piştrast kir ku bendav hemû saxlem in.

**RESTOREKIRINA BENDAVAN**

Mûse Xelef piştrast kir ku her sal bendavan restore û paqij dikin. Herwiha lêkolînên paşrojê ji bo parastina van bendavan tê kirin û çawa ku sûdê zêdetir di çandiniyê de jê bigirin.



Xelef wiha lê zêde kir: “Rewşa bendavan tevan jî baş e û di binê kontrol û çavdêriyê de ne û metirsiya hilweşîna wan nîne.”



## Hemleya Mazlum Dogan

Farûk SAKIK

Êrişên dagirkerên Kurdistanê roj bi roj zêde dibin. Her wek leyîstika Satranc-Kişikê şerek li dijî Kurdan tê meşandin. Di van rojan de dîsa ji Kurdan re gotin ŞAH û Kurd jî ji bo MAT nebin bi hemleya Mazlûm Dogan a “Berxwedan Jiyane” bersiv didin. Û kurd bi vê hemleyê ji sala 1982’yan ve li ber xwe didin. Tu hêzek, tu faşîzmek, tu xiyanetek, tu dagirkeriyek piştî vê hemleyê nikare Kurdan mat bike.

Di dîrokê de gelek caran jî hewl dan, bi Pîyonên xwe Kurdan MAT bikin, lê bi serneketin. Di sala 1982’yan de li zîndana Amedê bi hemleya Pîyon Esat Oktay Yildiran, di salên 90’î de bi hemleya Piyon PDK’ê û di sala 2014’an de li Rojava bi hemleya Pîyon DAÎŞ, me dît çawa dixwestin Kurdan mat bikin, lê bi hemleya Mazlum Dogan ew MAT bûn.

Îroj jî dewleta Tirk a dagirker, li Qendîlê li dijî tevgera Azadiyê û gerîlla, li Şengalê li dijî sîstema ku piştî Fermana 73’yan ji xwe re avakirine û li Rojava jî li dijî rêveberiya xweser konsepteke nû daye destpêkirin. Kurdan jî bi pengava KCK’ê ya bi dirûşma ‘Dem dema azadiyê ye’ bersiv dide vê konseptê. Ev pengav îro li her derê belav dibe û azadiya Rêber Apo jî esas tê girtin.

Ji bo vê yekê, li zindanên Tirkiyê û Bakûrê Kurdistanê jî, dîlên azadiyê 27’ê Mijadarê hemleya M. Hayrî Dûrmuş dane dest pê kirin. Ji bo şikandina tecrîdê û azadiya Rêber Apo dest bi çalakiya greva birçîbûnê kirin. Wan baş dizanibû ku M. Hayrî Durmûş di kîjan şert û mercên zîndana Amedê de, di 14’ê Tîrmehê de, starta vê çalakiya encamgirtinê çawa dabû. Girtiyên dîl yên PKK û PAJK’ê jî bi heman vîn û baweriyê, dest bi “Hemleya M.Hayrî Durmuş” encamgirtinê kirin. Dîsa wek hemleya Mazlûm Dogan, me galak caran ji hemleya Hayrî Durmûş a çalakiya zîndanan re şahidî kir ku çawa encam girtine.

Dema ku pêngavê destpêkir, li her deverên ku kurd dijîn bi bandor di bûn. Îsal dema li parlementoya Tirkiyê, li ser butçeya Tirkiyê ya sala 2021’an nîqaşan destpêkir, parlamenterên HDP’ê di helwest û axaftinên xwe de performansek mezin nîşandan. Her wek ji pêngava Kurdan wan jî bandor girtibû, bersivên dîrokî di dan wezîrê karê hundirîn Suleyman Soylu. Parlamenterê HDP’ê Kemal Bulbul di axaftinek xwe de digot; hûn Esat Oktay bin em jî Kemal Pîr in.

Di salên zindana Amedê de Esat Oktay her tim ji Kemal Pîr re digot; ‘Laz Kemal’. Tu carî nikaribû berxwedana Kemal pîr bişkêne. Piştî êşkenceyên mezin rojek Kemal Pîr li dadgehê dibêje, “Esat Oktay, li kuderê dibe bila bibe, wê tîma Kurdan a tolhildanê silavên min jêre bibin.” Dema ku di sala 1988’an de hat kuştin, çalakvanê PKK’ê berî tetîk bikişîne, di guhê wî de waha dibêje; “Slavên Laz Kemal hene”. Ji wê demê ve “Slavên Laz Kemal” tê wateya tolhildanê.

Li çiyayê Kurdistanê jî gerîlayên HPG’ê tevlî vê pêngavê bûn. Gerîlayên Kurdan li dijî dagirkeriyê bi baweriyek mezin hemleya Kemal Pîr dane destpêkirin. (Kemal Pîr yekem ji wan kesan bû ku ji bo şerê gerîlatiyê xebat kiribû) Li Bakûr û Başûr darbeyê mezin li artêşa Tirk û çeteyên wî dide. Piştî hemleya Kemal Pîr destpêkir, em heroj di Gerîla Tv de Slavên Laz Kemal dibihîzin.



# Xedîce Îbrahîm: Dewleta tirkî ya dagîrker jinên Kurd dike armanc

Hevseroka Yekîtiya Parêzeran ya Herêma Cizîrê Xedîce Îbrahîm diyar kir ku vîna jinên Kurd armanc tê girtin, dadgehên dewleta tirkî li dijî destdirêjiya li dijî jinên Kurd dengê xwe dernaxin û got, “Saziyên berpirsyar di bêdengiya mirinê dene.”



Dewleta tirkî ji demeke dirêj ve li dijî jinên Kurd destdirêjî, qirkirin û işkenceyê dike û didomîne.

Hevseroka Yekîtiya Parêzeran ya Herêma Cizîrê Xedîce Îbrahîm têkildarî mijarê got, “Işkence, tundûtûjî, qirkirin û detdirêjiya li dijî jinên Kurd bi mebesta bêdengkirinê tên kirin.”

Li gorî daneyên Navenda Lêkolîn û Parastina Mafên Jinan, li Efrîn, Girê Spî û Serê Kaniyê ku ji aliyê dewleta tirkî ve hatine dagîrkirin, sûc û binpêkirinên li dijî jin û zarokan wiha ne: Hejmara jinên hatine kuştin: 88, hejmara jinên revandî: 140, hejmara jinên birîndarbûyî: 176, hejmara zarokên hatine kuştin: 99, hejmara zarokên revandî: 11 û hejmara zarokên birîndarbûyî: 176.

**‘QANÛNÊN DEWLETA TIRKÎ DESTDIRÊJIÊ DIPARÊZIN’**

Xedîce Îbrahîm bîr xist ku dewleta tirkî ya dagîrker, jinên Kurd armanc digire û got, “Dewleta tirkî di nav gelê Kurd de bi taybetî jinên Kurd ji xwe re dike armanc. Di nav civakê de bi çavê namûsê li jinan dinerin. Ji ber wê dewleta tirkî vê bi kar tîne û bi vî awayî siyaseta şerê taybet li dijî malbatên Kurd dimeşîne.”

Xedîce bal kişand ser dadgeh û qanûnên ku berpirsyariya xwe ya li dijî sûcên li jinan têne kirin pêk naynin û got, mixabin berevajiyê wê, dadgeh û qanûn kesên destdirêjî jinan dikin diparêzin û wan dernaxin dadgehan.

**‘DIVÊ DADGEHÊN MAFÊN MIROVAN HESABÊ JI DEWLETA TIRKÎ BIPIRSIN’**

Xedîce bîr xist ku her roja ku diçe sûcên dewleta tirkî ya dagîrker li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê zêdetir dibin û eşkere kir ku li herêmên ji aliyê dewleta tirkî ve hatine dagîrkirin, siyaseta pêkanînên tundûtûjiya li dijî jinan, bûyerên destdirêjî û revandinê dewam dikin û got, ev kiryar hemû li pêş çavên dinyayê tên kirin.

Xetîcê bîr xist ku sûcên li dijî rûmeta mirovahiyê ku bi destê dewleta tirkî û çeteyên wê, li Serê Kaniyê, Girê Spî û Efrînê tên kirin, gelek zêde ne û wiha axivî: “Li gorî daneyên li ber destê me rêjeya van sûcan gelekî bilind e. Komîteyên mafên mirovan ên navneteweyî heta niha jî qet neketine wan deverên dagîrkirî. Sûcên li van deran nayên eşkerekirin. Her kes dizane ku dewleta tirkî her roj destdirêjiyê bi jinan dike, wan wekî mal li bazaran difiroşe. Saziyên berpirsyar jî xwe li ker û kor û laltiyê danîne.”

# YJA Starê nasnameya Fermandar Aryana Baran eşkere kir



Fermandariya Biryargeha Navendî ya YJA Starê nasnameya fermandar Aryana Baran ku di Mijdara 2020’an de li Herêmên Parastinê yên Medyayê ji ber nexweşiya pençeşêrê şehîd bûbû eşkere kir.

Fermandariya Biryargeha Navendî ya YJA Starê Fermandar Aryana ku Mijdara 2020’an li Herêmên Parastinê yên Medyayê ji ber pençeşerê şehîd bûyî bi bîr anî û got, ‘‘Me ewladeke giranbiha ya vê xaka pîroz, jineke şoreşger û berxwedêr ya Hilwanê û di heman demê de fermandareke jin ya pêşeng şehîd da. Tekoşîna bê dawî ya 21 salan ya hevrê Aryana wê idîa û baweriya me ya ji bo serxistina xeyal û hêviyên wê xurtir bike.’’

Di daxuyaniya YJA Starê de wiha hat gotin: “Hevriya me Aryana Baran di malbateke welatperwer de li bajarê Hîlwanê hatiye dinê û bi vê çanda têkoşer mezin bûye. Ji zarokatiya xwe ve zordarî û mêtîngeriya ku li ser vê herêmê meşiyaye re şahidî kiriye, li beramber vê dil û ruhê xwe her tim ji têkoşînek bê eman re amade kiriye. Rewşa civaka xwe û bi taybetî êrişa ku li hemberî jina serhildêr ya li vê herêmê çêbûye ti caran nepejirandiye û serî rakiriye. Êşên jina Kurd di civaka Kurdistanê û bi taybetî di herêma jê hatiye de ji kûr ve hîs kiriye û her tim xwestiye tola kîn û hêrsa hezarê salan ya li beramber çanda dayika pîroz ji pergal û hişmendiya serdest bistîne. Bi vî awayî dest bi rêwîtiyek dûr û dirêj kiriye. Ji bo xwe bigihîne refên tevgera azadiyê her rê û rêbaz ceribandiye.”

# Kongreya Star komxebatek li Dêrikê li dar xist

Kongreya Star şaxê herêma Dêrikê ji bo nîqaşkirina gelek mijar û pirsgirêkên girêdayî jinan û rêbazên çareserkirinê komxebatek li dar xist.

Kongreya Star şaxê herêma Dêrikê bi armanca nîqaşkirina pirsgirêkên civakî yên girêdayî jinan, mîna zewicandina di temenê piçûk de, xwekuştin, zewaca ser jinekê re û rêbazên çareserkirinê, komxebatek li xwaringeha Çerçela li dar xist. Endamên Kongreya Star û nûnerên saziyên civaka sîvîl beşdarî komxebatê bûn.

Di komxebatê mijarên zewicandina di temenê piçûk de û zewaca ser jinekê re hatin nîqaşkirin.

Hat gotin divê zewicandina di temenê piçûk de were bidawîkirin û bal kişandin ser bandora fîzîkî, tenduristî yên li ser jinan û civakî yên vê zewicandinê.

Beşdaran bal kişand ser şerê taybet û şerê çekdarî ku li gelemperiya herêmê diqewime. Hat gotin şer bandoreke neyinî li civakê kir û di encamê de zewicandina di temenê piçûk de, tundiya li ser jinan zêde bû. Herwiha hat gotin ku ji ber rêgirtina li ber tundiyê û van diyardeyan perwerdekirin û



hişyarkirina civakê pêwîst in.

Komxebat bi gelek biryaran bi dawî bû. Ji wan; xurtkirina rêxistinkirina jinan, pêkanîna qanûnên girêdayî jinan, belavkirina metoda hevjiyana azad li hemberî zihniyeta zayendperestî û modernîteya kapîtalîstê.

# “Ku heskirin hebe tiştek nikare vînê bişkîne”

Leylan Reso/Ronahî-Qamişlo



Mijara tenduristiyê di her qada jiyanê de girîng e, lê li cem gelek kesan astengdarî nabe kelem. Digel tenduristiya ne baş, li ber xwe didin û tiştek nikare vîna wan bişkîne.

**“BÊHNA AXA WELAT JI MIN RE DERMAN E”**

Têkildarî mijarê jina bi navê Nisrîn Mehmûd ku li Amûdê bi “Mala Şûşê” tê naskirin, li ser nexweşiya xwe wiha axivî: “Temenê min 40 e. 9 Mehî ta min digire. Min dibin bijîşkê Qamişlo. Ji bijîşk weye ku bi grîbê ketime, nizane ku felcê li min daye. Ji ber derziya li min xistî rayên lingên min hişk dibin. Piştî hingê min dibin Şamê. Bijîşkên wir dibêjin, çareya vê nexweşiyê nîne û ji hingê ve çare nehatiye dîtin. Komeleya mirovî bisiklêtek daye min lê ew jî pir kevin bûye. Pêwîstiya min bi yeke nû heye. Malbatê dixwest min bişînin derve, lê min nedixwest dûrî welatê xwe bikevim. Bêhna axa welat ji min re derman e.”

**“RAST E ASTENGDAR IM LÊ LI BER XWE DIDIM”**

Nisrîn Mehmûd di dawiya axaftina xwe de behsa kar û xebata xwe kir: “Min heta refa 9an xwend. Min dixwest bixwînim, lê ji ber nexweşiyê min nikarî. Piştî hingê li malê rûniştim. Hêviyên min pir bûn lê mixabin daxwaziyên min pêk nehatin. Ji ber ku dayîka min terzî bû, ez jî fêrî dirûtina cilan kirim. Ez ji karê xwe pir hes dikim. Niha jî berpirsiyariya malê li ser milê min e. Ji ber ku bavê min nexweşê penceşêrê ye nikare ti karî bike. Dermanê wî bi 300 hezarî ye û mehê du caran em dikirin. Ez balîv, sifinc, med erebî, perde û cilên zarokan didirûm û ji sûkê kêmtir distînim. Çimkî gelê me xizan e. Rast e astengdar im lê li ber xwe didim. Pêwîstiya min bi makîneyeke dirûnê heye.”


# Hevseroka MSD’ê: Ji bo ku Eyn Îsa rasdestî hikumeta Şamê bike, Rûsya zorê dide QSD`ê

Hevseroka MSD`ê Emîne Umer diyar kir ku Rûsya berpirsa êrişên dewleta tirkî yên ser Eyn Îsa ye û got, “Rûsya ji bo ku navçeyê radestî hêzên hikumeta Şamê bike, zorê dide QSD`ê.”



Artêşa Tirk ya dagîrker û çeteyên wê bi awayekî hovane êrişî navçeya Eyn Îsa dikin. Dewleta tirkî balafirên şer û yên bêmirov di van êrişan de bi kar tîne.
Hevseroka Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) Emîne Umer diyar kir ku dewleta tirkî ji van êrişan hewl dide herêmên din yên bakur û rojhilatê Sûriyê dagîr bike û wiha domand: “Dixwaze ewleyiya herêmê têk bibe û riya di navbera herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê de qut bike. Lewre ev rê stratejîk e û li ser riya M4 e.”
Emîne da znîn ku Rûsya berpirsa van êrişên li dijî Eyn Îsa ye û ev li gotinên xwe de zêde kir: Çimî ew berpirsa parastina herêma Eyn Îsa ji êrişên Tirkiyê ye.”
Emîne da zuyakirin ku Rûsya erkê xwe pêk nayne û êrişên dewleta tirkî ranewestandin. Her wiha bîr xist ku Rûsya zorî dide Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) da ku navçeyê radestî wê bikin û pişt re radestî hêzên hikumeta Şamê bikin.

## Salih Muslim: Provokasyon hene, divê ti kes bi van lîstikan nexape



Salih Muslim diyar kir ku êrişên li Amêdiyê û şewitandina bûroyên ENKS’ê bûyerên biguman in û got, ev di çarçoveya hewldanên derxistina pevçûna di nava Kurdan de dibin û dibe dewam bikin.
Salih Muslim têkildarî şewitandina bûroyên ENKS’ê û reşkirina sîstema Rêveberiya Xweser ji aliyê hin rayedarên PDK’ê ve di dema xebata yekîtiyê de, got, “Ev ji hewldanên pêşîgirtina li yekrêziya kurdî ye. Divê ti Kurd bi van lîstikên dijmin nexape. Divê partiyên li herêmê û gelê me hişyar bin.”
Muslim êrişên PDK’ê û ‘Pêşmergeyên Roj’ yên li Amêdiyê wek provokasyon bi nav kirin û wiha got: “Ev êriş nakevin berjewendiyên gelê Kurdistanê. Kesên ku destdirêjî û astengiyê li ser gerîlayan bikin wê li cem gelê Kurd iflas bikin.”
Muslim da zanîn ku gelê Kurd yê her çar parçeyên Kurdistanê di binê êrişên dewleta tirkî ya faşîst de ye. AKP-MHP li ser plana hilweşandina tevgerên kurdî û gelê Kurd tev digerin. Li Rojava gelek pêşketin hene, gel sîstema xwe çêkiriye û bi pergala xweseriya demokratîk xwe bi rê ve dibe. Dewleta tirkî hilweşandina vê sîstemê ji xwe re erk dibîne. Ji bo hilweşandinê jî rayedarên PDK’ê yên weke Mesrûr Barzanî kirine bela serê Kurdan. Bi awayekî dev diavêjin Rojava û dixwazin bandoreke neyînî pêk bînin.
Muslim da xuyakirin ku bi mebesta yekrêziya kurdî diyalog pêş ketine. Di demeke wiha de şewitandina bûroyên ENKS’ê li herêmê ji hewldanên hilweşandina diyalogê ne. Bi taybetî hewldanên wan li ser pêşîgirtina yekrêziya kurdî ne. Ji ber wê her tiştî dikin. Li pişt vê planê jî bêguman dewleta tirkî ya faşîst heye. Ji ber wê divê partî û gelê me hişyar bin. Lewre em di pêvajoyeke hesas de dijîn. Divê em lîstikên dijmin têk bibin. Reşkirina Rêveberiya Xweser ji aliyê hin rayedarên PDK’ê ve (weke Mesrûr Barzanî) parçeyek ji vê planê ye ku naxwazin sîstema herêmê pêş bikeve.

## Cemal Şêx Baqî: Li dijî Kurdan komplo hene û PDK bi komplogeran re ye



Cemal Şêx Baqî da zanîn ku planeke mezin li dijî destkeftiyên Kurdan heye, bi taybetî li dijî rojavayê Kurdistanê û herwiha sekna PDK’ê li gel komplogeran çewtiyeke dîrokî ye.
Têkildarî geşedanên dawî yên li herêmê, bi taybetî başûr û rojavayê Kurdistanê, ANHA hevpeyvînek bi Sekreterê Giştî yê Partiya Demokratîk ya Kurd li Sûriyê PDK-S Cemal Şêx Baqî re çêkir.
Şêx Baqî wiha got: “Planeke mezin li dijî rojavayê Kurdistanê dimeşe, serê wê jî dewleta tirkî û Rûsya ne. Ew hewl didin fişarê li Rêveberiya Xweser bikin, da ku herêmê radestî hikumeta Şamê bikin. Li aliyekî din jî Îran ji bo fişara li Emerîka hevkarê wan e. Herwiha PDK jî bûye bikirê dewleta tirkî ya ku bi dehan baregehên istixbaratî li başûrê Kurdistanê ava kirin.”
Şêx Bawî axaftina xwe wiha domand: “Kesên rewşê dişopînin, wê bizanin ku em di merheyelek nû re derbas dibin. Ji destpêka şoreşa Rojava ya 19’ê Tîrmehê û heta niha, rojekê jî bê planên dijmin yên li dijî herêmê derbas nebûye. Ew plan bi armanca têkbirina azadiya gelan û projeya demokratîk ya xwerêvebirinê û xebata ji bo demokratîbûna tevayiya Sûriyê ye.
Destpêkê êrişî bi vî awayî ne xurt bûn. Dijmin tevayiya rêbazên xwe ji bo çewisandina vîna gelê herêmê ji êrişên yekser, neykeser û şerê taybet bi kar anîn. Ew êriş jî bi riya wekîlên xwe yên mîna Cebhet El-Nusra, çeteyên DAIŞ’ê û qaşo Artêşa Azad pêk hatin. Lê piştî wekîl bin ketin û berxwedana gelên herêmê ya li dijî terorê li seranserê cîhanê deng veda, Koalîsyona Navneteweyî piştevaniya herêmê kir û teror hat têkbirin.”
Li ser pirsekê Şêx Baqî wiha axivî: “Sewqîkirina PDK’ê ya Pêşmergeyên Roj li Herêmên Parastinê yên Medyayê, planeke xirabkirinê ya xeternak e û bandora wê yekser li Rojava hene. Tev dizanin ku ciwanên ji Rojava di nava hêzên gerîlayan de ji dehê salan ve hene, şer dikin. Lê heke pevçûnek çêbe, wê bira birayê xwe bikuje.
Anku PDK bi vê planê hewl dide tevliheviyekê li Rojava çêke. Armanceke din jî ji sewqîkirina PDK’ê ya hêzên xwe li Herêmên Parastinê yên Medyayê, dorpêç û çemberkirina Tevgera Azadiya Kurdistanê ye ku kûrahiya têkoşîna şoreşgerî li Kurdistanê û Rojava ye. Me xwest ku PDK piştevanê me be. Lê belê ew wê yekê naxwaze.”



## Eyn Îsa

Ahmet AKTAŞ

Armanc û daxwaza sereke ya dewleta tirka; hilweşandina destkeftî û şikandina îradeya gelê kurd e. Eger ev pêknehat, hewl dide ku astenga derxe ber pêşiya Tevgêra wê, ji bo bandoro wê li parçeyên din bişkîne, siyasetek qirêj a qirker dide meşandin.
Weke kurte şîroveyekê, mirov dikare vê mijarê wisa bide xuyakırın:
1. Li Bakur, di kesayetiya HDP’ê de, êrîşî ser hemû deskeftiyan; sazî û dezgeh û rêveberên Kurdistanî dike. Bi dehan kuştî, bi sedan birîndar, bi hezaran girtî û hwd.
2. Li Rojhilat, di kesayetiya PJAK’ê de, ji bo gel bitirsine û bandora Tevgêra Azadiyê xurt nebe Îran, xort û keçên kurdan dixe zîndanan û li sêdarê jî dide.
3. Li Başûr, di kesayetiya Şingalê de Tirk û Erbîl, êrîşî ser hemû sazî û rêxistin û kesayetiyên dilxwazê Tevgêra Azadiyêne dike, dîl digre, dikuje û ji bo têkiliyên wan ji Mexmûr û Qendilê û Rojava biqetîne, dorpêçkirin û zordestiyê bikartîne.
4. Li Rojava, bi taybetî vê dema dawî, di kesayetiya Eyn Îsa de Tirkiyeyê, hemû Rojava; Rêveberiya Xweseriya Demokrati, PYD, YPG, QSD, PYNK û bi giştî destkeftiyên Şoreşa Rojava, kiriye armanca êrîşên xwe yên qirker û dagirker.
Hilbet dewleta tirka tê naskirin, bi serê xwe nikare gavekê bavêje, daxwazên wê çi dibe bila bibe, bêyî destûra Emerîka û Rûsya nikare tevbigere. Nuha li vira, di rû re bi destûra Rûsyayê tevdige, lê ev ne bêyî agahiya Emerîka ye; tê zanîn ku hevalbendê wan ê stratejik e!
Li goreyî rewşa tê dîtin, bi taybetî karê dewleta tirka ya li Başûr û Rojava wisa hatiye dabeşkirin:
Peymana Şingalê, bi koordinasyona Tirka, birêvebirina kiryarî dane destê rêveberiya Bexda û Erbîlê.
Plana Eyn Îsayê jî dewleta tirka bi xwe dimeşîne. Erê bazarê Rûsya dike û Rêveberiya Xweser bi mînaka Efrînê ditirsîne, lê gûman heye ku hîn DYE destûr bi temamî neda ye ku dewleta tirka bi hemû hêzên xwe ve, weke mînak bi firokên şer êrîşî ser Eyn Îsa bike.
Rûsya, di nava lîstokek gelek xeter û piralî de ye. Him dixwaze tirka bike hevparê plana xwe û bi vêna ve, him QSD tengav bike û têkiliyên wan ji DYE dûr bixe û bi navê “vira radestî rejîmê bikin” ve bixe bin bandora xwe. Him bi vê lîskê nakokiyên tirka û DYE jî kûrtir bike. Bêgûman li vîra, bi tenê tirk, di nava dudiliyekê de ye, “gelo di vê valatiya Trump-Biden de, li gel Rûsya vê êrîşê bike an neke?”.
Ji aliyê kurdan ve, divê ev lîsk û armancên van dewletan baştir, werin naskirin, ji siyaset û kiryarên wan ên berê, bêhtîr ders werin derxistin û li goreyê wê tedbîrên hîn xurtir werin standin. Bêgûman bi giştî Tevgêra Azadiya Kurdistanê, li goreyê van stratejî û tektîkan amadekariyên xwe dike, da ku karibe destkeftiyan, ji van plan û lîstokên gemar ên van dewletan, bi parêze û her bi pêşkeve.



# Hêzên Hewayî ya Şehîd Delal Amed li Heftenînê li dijî dagîrkeran du çalaki kirin

HPG’ê ragihand ku li Heftanînê hêzên Hewayî yên Şehîd Delal Amed 17’ê Kanûnê li dijî hêzên dagîrker du çalakî kirine.



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG’ê têkildarî mijarê daxuyaniyeke nivîskî da û da zanîn ku çalakiyên hatîn kirin bi serkeftî pêk hatine.
Naveroka daxuyaniyê wiha ye: “Hêzên Parastinê yên Hewayî ya Şehîd Delal Amed 17’ê Kanûnê saet 10:00 û 13:00’an li dijî dagîrkerên li Girê Koordîne yê devera Bektorya ya Herêma Heftenînê bi amûrên hewayî du çalakî kirin. Di her du çalakiyan de hedef bi serketî hatine lêdan û çalakî bi serketî pêk hatine.
Êrîşên artêşa Tirk ya dagîker yên ser Herêmên Parastinê yên Medyayê dewam dikin.

## “Ji bo ku em azad bin, divê rêberê me azad be”

Hediya HISÊN/Ronahî-Amûdê



Ji bo şkandina tecrîda li ser rêber Abullah Ocalan û işkenceya li zindanan, girtiyên ji doza PKK û PAJKê yên li girtîgehên Tirkiyê 27 Mijdarê dest bi pêngava gireva birçîbûnê kirin. Pêngav di roja 27an de didome.
Derbarê mijarê de hevseroka “Edaleta Jinê” ya li navçeya bajarê Amûdê Mira Zoro wiha axivî: “Şoreşa me, şoreşa azadiyê û rizgarkirina Kurdistanê ye. Ji bo ku em azad bijîn divê serokê me jî azad be. Bi dehê salan e çalakiyên greva birçîbûnê hene. Berxwedana li zindanê hevala Sara û Çiyager dest pê kirin û îro havalên me li ser rêça wan didomînin. Bi pêngav û çalakiyên wiha em tecrîda li ser serok dişkînin û bi ser dikevin.”
Mira Zoro axaftina xwe wiha qedand: “Li ber hevalên di zindanê de em bejina xwe ditewînin. Herwiha banga min ji Kurdan tevan re heye ku bi çalakiyên xwe piştgiriya berxwedana li zindanan bikin heta ku em bi ser bikevin.”

## Êrişên artêşa tikrî ya dagîrker yên ser başûrê Kurdistanê bênavber didomin



Dewleta tirkî ya dagîrker bi balafirên şer herêma bajarokê Batûfa yê Zaxo bombebaran kir. Balafirên şer yên dewleta tikrî ya dagîrker nîvê şevê herêma bajarokê Batûfa yê Zaxo bombebaran kirin.
Derbarê ziyanê de agahiyên zelal nehatin bidestxistin.
Berî vê êrişê jî artêşa tikrî ya dagîrker li Girê Bî yê li navçeya Zaxo ya girêdayî Dihokê, gundê Hirûrê û gundên li ser riya Hirûrê topbaran kirin.

## Artêşa tikî ya dagîrker li gundên Zaxo daran dibire û dibe Tirkiyê



Artêşa tirkî rê biriye gundê Keşanê yê Zaxo û derdora wî.

Êrişên artêşa Trik ya dagîrker yên ser başûrê Kurdistanê dewam dikin. Artêşa Tirk û çeteyên wê li daristanên gundên Zaxo daran dibirin, derbasî Tirkiyê dikin û difiroşin.
Artêşa tirkî ya dagîrker sûcên li Efrînê dike, li başûrê Kurdistanê jî dike.
Li gorî agahiyên Rojnewsê ji çavkaniyên herêmî girtîn, artêşa tirkî ya dagîrker li hinek herêm û gundên Zaxo bi hinceta çêkirina riyan, daristanên herêmê wêran dike, darên gundan ji kokê ve jê dike.
Çavkaniyên ji herêmê ragihandin ku ji destpêka havînê ve artêşa tirkî ya dagîrker dest bi jêkirin û hilkirina daran kiriye. Çavkaniyan diyar kir artêşa tirkî hilkirin û wêrankirina daristanên Zaxo bi destê çeteyê bi navê Cafer Benek yê li herêmê kontratiyê dike pêk tîne.
Riyeke din jî li aliyê Geliyê Pisaxa ve çêdike. Heta gundê Bilehê, ji wir Kaniya Gûzê ya zozanên Bişar Axa, ji jor de jî anîne gundê Elaniş, Siyara Gewrik, beramber gundê Şeranişa Xiristiyanan û ji wir jî birine Xantûrê.
Çavkaniyên herêmî dan zanîn ku darên hildikin, derbasî Tirkiyê dikin û ji bo xwe difiroşin.
Hinek rojnameyên erebî jî heman mijara wêrankirina jîngeha gundên Zaxoyê ji aliyê dewleta tirkî ve li ser zimanê şêniyên van gundan, xistine rojeva xwe.

## HPG: Bila ti kes baweriya xwe bi nûçeyên derew neyne




HPG’ê têkildarî nûçeyên li hin saziyên çapemeniyê û hesabên medyaya dîjîtal ku dibêjin li ser riya Sîdeka bombe hatine bicihkirin, daxuyaniyek da û got, “Bila ti kes baweriya xwe bi nûçeyên derew neyne.”
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG’ê li ser mijarê daxuyaniyek weşand.

**Di daxuyaniyê de wiha hat gotin:**
“Hin organên çapemeniyê û hesabên medyaya dîjîtal dibêjin PKK’ê bombe li ser riya bingehî ya bajarokê Sîdeka bi cih kirine. Ev nûçeyên hatîn weşandin nûçeyên bi zimanê medyaya şerê taybet hatine amadekirin, nûçeyên şaş û derew in. Dost û dijmin her kes dizane ku hêzên me yên gerîla ti carî nekevin nava hewldaneke bi vî rengî ya li hemberî gelê xwe. Nûçeyên bi vî rengî yên derew yên li dijî tevgera me, xizmetê ji armancên provokatîf re dikin. Divê dev ji hewldanên bi vî rengî bê berdan ku ne li gorî berjewendiyên gelê Kurd in. Bila gelê me û bi taybetî jî xelkê herêmê baweriya xwe bi nûçeyên wiha derew û provokatîf neyne.”

## PDK hevkariyê kûr dike



Zekî BEDRAN

Kesê bi navê Serbest Lezgîn di televizyonê de dibêje; PKKê ji bo Kurdan tiştek nekiriye û divê ji Başûr derkeve. Weke din dixwaze ji Şingalê jî derkeve. Sirf bi navê xwe, yan jî bi navê hikumeta Başûr PKKê ji hêzên din re dike hedef. Halbiku gerîlayên PKKê ji sala 1982yan ve li Başûr dimîne. Bi taybetî li şûna ku Şingal li bo Serbest bibe ciyê şermê, di nava kêferatê de ye ka wê çawa PKKê bixe tengayiyê û Êzîdiyên ji komkujiyê re hiştîn bi navê wan ti rêxistin neminin. Jixwe piraniya Êzîdiyan li Şingalê namînin. Ji ber DAIŞê reviyan yan çûn Ewropa yan jî di kampên koçberan de ne.
Dema DAIŞê êrişî Şingalê kirî ji ewlekariya wir PDK û pêşmerge berpirs bûn. Jimara pêşmergeyan jî bi hezaran bû. Fermandarê wan jî Serbest Lezgîn bixwe bû. Kê ferman da pêşmergeyan ku bê teqandina fişekekê dev ji Şingalê berdin. Divê Serbest bi navê gel li dadgehekê were darizandin. Kî bû sedem ku bi hezaran Êzîdî hatin kuştin, bi hezaran bûn dîl, bi hezaran jinên Êzîdî li bazara dîlan hatin firotin? Nikare bêje, “şer e, me şer kir lê hêza me têrê nekir.” Liwre bi DAIŞê re hîç neket nava şer û bi sedhezaran Êzîdiyên bêçek û bêparastin hiştin di nava lepên DAIŞê de.
Dibêje, “bila ji Şingalê derkevin, ne yên vir in.” Bi vî awayî dixebite ku gelê Başûr bike dijber û serê Êzîdiyan jî tevlîhev bike. Dibêje; “hêzên biyanî yên biçek” û di serî de Iraq ji Emerîka û Tirkiyê re dike hedef. Her kes dizane ku ji bo pêşîgirtina li komkujiyan gerîla çû Şingalê. Dema ku ew ji Şingalê direviyan gerîla berê xwe da wir. Pêşiya qirkirineke mezin girtin. Êzîdiyên mayîn parastin û ji perwerdeya wan ya ji bo xweparastinê xwerbirêxistinkirinê re bûn alîkar. Ji bilî vê tişteke ketî destê gerîla nîne. Dema gel bi kêrî xwe hat jî hêzên xwe yên bingehî ji wir kişandin. Derdê PDKê bi zanebûn, xwebirêxistinkirin û bûna Êzîdiyên ya îradeyê ve têkildar e. Weke bere wê ew bimeşînin, hukum li wan bikin û desthilatdariya xwe mayînde bikin.
Berî niha bi yekîneyên bizirxî êrişî Şingalê kirin. Ji bo ku şer dernekeve 2 gerîlayên ji bo axaftinê çûyîn cem wan jî di navê de 6-7 kes kuştin. Dema fêm kirin ku wê rezîl bibin bi şûn ve gav avêtin. Lê dev ji hirsa serdestiyê bernedan. Bi êrişên Tirkan re wan jî êrişên xwe zêde kirin. Pişt re bi pêşengiya Emerîka bi Tirkan re bi ser Iraqê de çûn. Bê ku guhê xwe bidin Êzîdiyan bi Iraqê re peyman imze kirin. Gotin; bila Kurd xwe bi rêve nebin, Şingal bikeve binê destê Iraqê bila bikeve. Lê xetera mezin ew e ku komplogerî û rêbaza siyaseta xwe didomînin. Halbiku Êzîtiyên wir ne di rojeva hukumeta Iraqû de ne. Êzîdî jixwe di nava sînorên Iraqû de ne. Hêzeke wan ku gefê li Iraqû bixwin û niyeteke wan jî ya wisa nîne. Lê bi komploya PDKê niha Iraqê bi hezaran leşker şandine wir. PDK vê bes nabîne, Iraqû geş û gur dike da şer derkeve. Dibêje Iraqê peyman tam pêk neaniye û çekdarên biyanî jî ji wir derneketine cilên xwe guhertine.
Serbest Lezgîn dibêje; gerîla ne welatiyên Iraqê ne, mafê wan nîne ku li erdê Başûrê Kurdistanê bimînin, ew ji bakurê Kurdistanê ne. Bi dehê salan e PDKê zimanekî wiha dijminane bi kar neanîbû. PDK ne ji kongerya neteweyî re dibêje erê, ne xwe nêzîkî diyaloga bi PKKê re dike. Li başûrê Kurdistanê bi dehan baregehên leşkeri yên Tirkiyê hene û her tim wir bombebaran dike. Serbest Lezgîn ji bo dijminê herî mezin yê Kurdan dewleta tirkî ya faşîst nabêje hêzên xwe ji vir derxe. Dibêje PKK li vir e ji ber wê êriş dikine. Bi vî awayî êrişan rewa dike. Di serî de Emerîka giliyê PKKê li cem dewletan tevan dike. Dixwaze bi vî awayî li hemberî PKKê eniyekê çeke.
Di serî de Êzîdî divê Kurdên li her çar parçeyan Serbest Lezgîn û xeta wî ya siyasî nas bikin û efû nekin.